# Rê Nedin Cihêkariyê

Ayrımcılığa Göz Yummayın

Cicoba vorsi mot dodumt

Göz Yummayın!

Dikha ma panden

Mikeste tumare yakha ma panden

Μην εθελοτυφλείτε απέναντι στις φυλετικές διακρίσεις

Дискриминацэр игъуэджэщ

لا تغلق عينيك عن كل أشكال التمييز



## Cudakarîya nijadî yan jî qewmî

**Hay ji mafên xwe hebin**

Komelaya çavdêriyê ji bo mafên wekhev

**Başvuru ve Hukuki Destek İçin:**
0212 293 63 77 - 0501 212 72 77
**www.esithaklar.org**



# CUDAKARÎYA NIJADÎ YAN JÎ QEWMÎ ÇI YE?

Cudakarîya nijadî yan jî qewmî, li hemberî yekî/ê ji ber nijad, reng, qewm, rewşa koçberiyê yan jî neteweya wî/ê bi awayekî neyînîtir tevgerîn e.

Bo mînak:
Ku emlaqfiroşek bes ji ber nijad an jî rengê çermê yekî/ê malekê nede kirê, “rasterast Cudakarî” derdikeve holê.

Lê ku ji bo herkesî bi heman awayî sepandina sazkirin an jî qanûnekê, li ser hin kesan ji ber nijad, reng, qewm, rewşa koçberiyê an jî neteweya wan bandorên neyînî biafirîne, ev wekî “cudakarîya nerasterast” tê binavkirin.

Wekî mînak, digel ji dersa zanîna dîn û exlaqê cudagirtina hin komên qewmî, di ezmûnên têketina zaningehê de li ser hemû beşdaran ferzkirina sepandina pirsiyarên dersa zanîna dîn û exlaqê mînakeke cudakarîya nerasterast e.

# NEFRETA NIJADÎ Û DESTDIRÊJÎYA JI BER NIJAD AN JÎ QEWMÊ YEKÎ/Ê ÇI YE?

Nefreta nijadî yan jî qewmî û destdirêjîya ji ber van taybetîyan, di qadên gelemper de li hemberî kesekî/ê di derbarê nijad, qewm, reng û taybetiyên wekî neteweya wî/ê de pêkhatina tevger û gotinên rencker, piçûkker û gefxwer e.

Nefreta nijadî yan jî qewmî û mînakên destdirêjiyên têkildar

- Li ser înternetê bi rêya medya civakî, malperên parvekirina videoyan, blogan û hwd. di derbarê nijadekê de parvekirina naverokên piçûkker

- Di rojname, kovar û cureyên weşanê yên din de bikaranîna gotinên piçûkker

- Di kombûnên civakî û civînên gelemper de heqaretkirina li nijadekê

- Di qadên gelemper ên wekî dikan, kargeh, wesayîtên veguhestina komelî yan jî dibistanan de di derbarê nijad an jî qewmekê de bikaranîna gotinên êrîşkar

- Di civînên werzîşê de, di derbarê nijadekê de ji aliyê lîstikvanan, antrenoran, temaşevanan an jî peywirdaran ve bikaranîna gotînên piçûkker





# QADÊN KU LI HEMBERÎ CUDAKARÎYÊ TÊN PARASTIN ÇI NE?

Li gorî Benda 90. a Makezagona Tirkîyeyê, hemû mafên ku di peymanên têkildarî mafên mirovan ên ku Tirkîye bûye teref de navên wan derbaz dibin, li Tirkîyeyê di bin parastina zagonî de ne.

Li gorî Benda 122. a Qanûna Cezayê ya Tirkîyeyê, Benda 5. a Qanûna Kar, Bendên 4. û 8. ên Qanûna Bingehîn a Perwerdehîya Neteweyî di qadên li jêr de cudakarî qedexe ye:

- Xebitandin- xebitîn, bendên peymana kar, perwerdehîya kar, paye, ji kar derxistin

- Perwerdehî- di dibistanên dewletê, yên taybet û di zaningehan de qeybûn û girtina dersan

- Sitirîn- kirêkirin an jî stendina mal an jî daîreyekê

- Tenduristî- girtina alîkarî û xizmetên tenduristîyê, gihêştina derman û alavên tenduristiyê

- Sûdwergirtina ji mal û xizmetguzarîyên giştî- xizmetguzarîyên veguhastin û ragihandinê, banqe û sîgorte, gihêştina xizmetguzarîyên taybet ên wekî parêzerî û bijîşkîyê, cihên wekî parq, daîreyên dewletê, restoranan û sepandinên yeksan di karxaneyên wekî dikan û navendên şahîyê de

# KU HÛN DÛÇARÎ CUDAKARÎ NIJADÎ YAN JÎ QEWMÎ BIMÎNIM, DIVÊ ÇI BIKIN?

**1.** Qeyda cih, dem, awayê pêkhatin û beşdarên bûyerê bigirin.


**2.** Kesên ku dê bikaribin govaniya bûyerê bikin bineqînin û zanyarîyên wan ên pevragihanê hildin

**3.** Delîlên wekî belge, fotoraf û video yên di derbarê bûyerê de berhev bikin.

**4.** Girtenameyên li cihên wekî polîsxane, nexweşxane yan jî dadgehan hatine girtin ligel xwe veşêrin.

**5.** Ku we di derbarê bûyerê de serî li damezraweyekê dabe, biryar û girtenameyên têkildar jê bistînin.

**6.** Ku bûyerê di çapemenîyê de cih girtibe, materyalên wekî nûçe û qunciknivîsaran berhev bikin.



# EZ ÇI DIKARIM BIKIM JI BO KU RÊ LI CUDAKARÎYÊ BÊ GIRTIN?

Ji bo ku rê li cudakarîyê bê girtin û mirovên ji çand û civakên cuda bibin xwedîyê heman maf û derfetên aborî, civakî û sîyasî, ji bo her kesî risteke ku bikare bigire ser xwe heye. Gava herî grîng a ku di vê mijarê de dikare bê avêtin, ragihandina binpêkirinên mafan û cudakarîyê ye.

Agahîyên têkildarî sepandinên cudaker ên li cihê ku hûn lê dijîn, li karxaneya ku lê dixebitin, li dibistana ku lê dixwînin, li damezrawe û sazîyên ku xizmetê jê distînin ên ku hûn dûçarî wan mane yan jî bûne govanê wan bi me re parve bikin. Li mafên xwe xwedî derkevin û kesên din di vê mijarê de teşwîq bikin. Hay ji mafên xwe hebin, li hemberî cudakarîyê bêdeng nemînin.



# Lİ TİRKÎYEYÊ Jİ BO CUDAKARÎYÊ CİHÊN SERÎLÊDANÊ:

**Sazîya Mafên Mirovan a Tirkîyeyê**
Ji bo her bûyera ku binpêkirina mafên mirovan dihundirîne, hûn dikarin bi awayekî bêpere serî li SMMT'ê bidin. Divê hûn di daxwaznameya xwe de salixê bûyerê bidin, şexs an jî sazîya ku hûn li dij gilîyê xwe dikin biaşkêrin, daxwaza xwe ya di derbarê bûyerê de û, ku hebin, delîl û belgeyên têkildar pêşkêşî dadgehê bikin. Di daxwaznameyê de divê nav, paşnav, destnîşan û navnîşana nişîngeha we hebin. Hûn dikarin daxwaznameya xwe bi rêya faks û postayê bişînin yan jî bi xwe bibin SMMT'ê. Ku sedemeke we ya hişwer hebe, hûn dikarin nihêngirtina nasnameya xwe bixwazin.

Navnîşan: Yüksel Cad. No: 23 Kat: 3 06650 Kızılay Çankaya Ankara
Telefon: (0312) 422 29 20 (bes ji bo agahîdanê)
Faks: (0312) 422 29 96
E-posta: tihk@tihk.gov.tr

**Sazîya Venêrîna Giştî ya Komara Tirkîyeyê**
Di rewşên dûçarî cudakarîyê bûnê yên di sazî û damezraweyên fermî de hûn dikarin bi awayekî bêpere serî li SVGK'ê bidin. Hûn serîlêdana xwe dikarin bi rêya e-seserîlêdana li ser malpera SVGKT'ê yan jî bi daxwaznameyeke ku naveroka bûyerê, daîreya ku tê gilîkirin, daxwaz û agahîyên şexsî yên kesê/a serîlêdayî dihundirîne bi rêya faks yan jî postayê ragihênin. Heke serîlêdan bi zimanekî ji xeynî Tirkî were kirin, ku sazî serîlêdanê guncav bibîne dê lêkolînê bike. Di gilîyên bi rêya faks an jî postaya elektronik ve hatine kirin de divê daxwazname û eslê belgeyan di nav 15 rojan de ji sazîyê re bê şandin.

E-Serîlêdan: http://ebasvuru.ombudsman.gov.tr/Giris.aspx
Navnîşan: Büyükdere Cad. Maslak Kasırları, Mabeyn-i Hümayun Kasrı Maslak Sarıyer İstanbul
Kavaklıdere Mah. Nevzat Tandoğan Caddesi No: 4 Çankaya Ankara
Telefon: (0312) 465 22 00
Faks: (0312) 465 22 65
E-posta: iletisim@ombudsman.gov.tr

**Dozgerî û Dadgeh**
Ji bo cudakarî û binpêkirinên mafan hûn dikarin dozgerîyan di derbarê sûcan de haydar bikin, alîkarîya hiqûqî bigirin û li hemberî kiryaran deweyan vekin.

ji bo van pêngavan alîkarîyeke hiqûqî ya profesyonel bigirin. Ku rewşa we ya oborî ji bo girtina parêzerekî/ê ne guncav be, hûn dikarin ji baroya bajarê hûn lê alîkarîya dadî bixwazin. Belgeyên pêwîst bo alîkarîya dadî ji baroyan;

Ji muxtêr belgeya rewşa dahatê
Ji muxtêr belgeya nişîngehê
Fotokopîya nasnameyê
Belgeyên bo dewê pêwîst

**Komeleya Çavdêrîyê ji bo Mafên Wekhev**
Hûn dikarin bi rêya e-posta, telefon, posta yan jî bi xwe di derbarê mijara ku hûn dûçarî cudakarî yan jî binpêkirina mefekê bûne de serî li Komeleya Çavdêrîyê ji bo Mafên Wekhev bidin. Komeleya me dikare alîkarîya hiqûqî bide we û li ser navê we serî li cihên guncav bide.

Navnîşan: Kamer Hatun Mah. Hamalbaşı Cad. No: 22/9 Galatasaray Beyoğlu İstanbul
Telefon: (0212) 293 63 77
E-posta: esithaklar@gmail.com




Komelaya
çavdêriyê
ji bo mafên
wekhev

**Başvuru ve Hukuki Destek İçin:**
0212 293 63 77 - 0501 212 72 77
**www.esithaklar.org**

***Bu broşür Avrupa Birliği finansman desteği ile yayınlanmıştır. Ancak içeriğinin Avrupa Birliği'nin görüşlerini yansıttığı düşünülmemelidir.***